–النضال العلني للحزب بدأ بعد ثورة ١٤ تموز، صحيح أن مسيرة النضال كانت متواصلة قبل الثورة، ولكنه كان نضالا سريا. ومع نجاح ثورة ١٤ تموز تقدم الحزب خطوة للأمام وبدأ العمل من خلال إصدار المنشورات وعقد العلاقات السياسية مع الأطراف الأخرى. ولذلك نستطيع القول بأن الفترة الممتدة من ثورة ١٤ تموز الى ١١ أيلول ١٩٦١ كانت فترة نضال سياسي من خلال إصدار الصحيفة إنتقالا الى النشاط الحزبي وعقد الصلات مع الأحزاب الأخرى والتي بدأت مع جبهة الإتحاد الوطني. وفي تلك المرحلة كان الحزب يتهيأ أيضا لخوض النضال المسلح، فقد شكل مجموعات مسلحة في العديد من المناطق الكردستانية، وحاولنا أن نكسب بعض الدول المحيطة بالعراق من أجل مساندتنا في حال شروعنا بالنضال المسلح، فقد إتصلنا أنا والأستاذ زبيحي وكمال فؤاد بالمسؤولين السوريين وطلبنا منهم مدنا بالأسلحة والإذاعة وما يمكن أن يقدموه لنا في حال اعلاننا النضال المسلح.

ولكن حين تفجرت ثورة ١٤ تموز أصبحت مهمة جميع الأحزاب والقوى العراقية هي حماية الثورة والجمهورية الوليدة وتقدمها، وكان الهدف المضاف للبارتي هو ترسيخ الديمقراطية لكي يتمكن شعبنا الكردي من الحصول على حقوقه القومية المشروعة.

كان النضال الفكري والسياسي أحد أهم ركائز نضال الحزب في تلك الفترة من خلال النشاط الإعلامي وإصدار الصحف وكانت النشاطات جميعها موجهة بإتجاه تثبيت نظام ديمقراطي تقدمي على أساس التعددية والرأي الحر، ولكن الموضوع أثار خلافات في وجهات النظر، حيث أن البارتي تبنى فكرة الديمقراطية الموجهة ويدعو الى توسيع إطارها بما يشمل تحقيق الحقوق القومية للشعب الكردي. وكانت أدبيات الحزب تركز على أن الديمقراطية هي الطريق الوحيد للإعتراف بالحقوق القومية وكان ذلك تغييرا ملموسا في شعارات وتوجهات الحزب.

المسألة الكردية والديمقراطية

*** إذن الجدل دار حول مفهوم الديمقراطية، فأي نموذج ديمقراطي اختاره الحزب للعراق؟**

–البارتي طالب بالديمقراطية الشعبية الموجهة، وذلك تحت تأثير الثورة الأندنوسية التي قادها أحمد سوكارنو وتلقى الدعم من القوى اليسارية والديمقراطية والتقدمية، وكان ذلك مبعث تقدمها. وفي العراق، عرف عبدالكريم قاسم مفجر الثورة بأنه المنقذ والقائد التقدمي الديمقراطي، وعليه فقد رأى الحزب والعديد من القوى التقدمية العراقية الأخرى أهمية إعتماد الديمقراطية الموجهة. وكانت خلافاتنا مع القوى العراقية الأخرى تتمحور حول مطلبنا بالحقوق القومية والحكم الذاتي، ونرى بأنه بدون تحقيق هذه المسائل لن تستقر الديمقراطية في العراق وستصاب الثورة بالشلل والتراجع.

لم نكن ننظر الى الديمقراطية من زاوية واحدة فحسب، بل كنا ننظر اليها من زاويتين، وهذا خطأ مازال العديد من القوى العراقية ترتكبها قصدا أو دون قصد، فقلنا مرارا وتكرارا أنه من دون الإعتراف بالحقوق القومية للكرد لا يمكن تحقيق الديمقراطية في العراق، ونرى بأن الكثير من الحقوق القومية للكرد ستتحقق في ظل الديمقراطية ومن دونها لا وجود للديمقراطية. فإذا كانت الديمقراطية تنحصر بطرف واحد عندها ستكون ديمقراطية عرجاء ومشلولة، وكان الحزب يشدد على هذه الثوابت في كتاباته ومنشوراته، ويريد بناء العلاقات من جديد مع القوى الأخرى على أساس الأخوة الكردية العربية والإعتراف بالحقوق القومية على طريق تحقيق الأهداف المشتركة البعيدة وقريبة المدى. حتى أننا في مسألة الإتحاد العراقي كنا نقول بأن الوحدة التي تحققت في العهد الملكي كانت وحدة قسرية، وأثرت هذه الطروحات في عبدالكريم قاسم أيضا الذي كان أشار في العديد من خطبه الى تحقيق "الوحدة العراقية الصادقة."

كنا نعتقد بأن مستقبل العراق يجب أن يبنى على أساس الأخوة العربية الكردية وتحقيق مطالبهم البعيدة والقريبة، وأن يصاغ هذا المستقبل على أساس الوحدة السياسية والإقتصادية والقومية، ونعتقد أيضا بأن ثورة ١٤ تموز أحدثت تغييرا كبيرا حتى في نفوس وقلوب الكرد أيضا، لأن الكرد لم يكونوا حريصين على وحدة العراق في العهد السابق كما هم عليه بعد ثورة قاسم وإعترافه بشراكة الكرد والعرب وحديثه عن الإصلاح الزراعي، وعليه كانت ثورته تحظى بدعم من شريحة واسعة من المجتمع الكردستاني.

***ما عدا ذلك، أي اتجاه سلكه الحزب في نضاله خلال تلك الفترة؟**

–سلك البارتي طريقا آخر للنضال السياسي، وهو عقد العلاقات مع الأحزاب الأخرى، ففي ذلك الوقت أصبحت بغداد مركزا لتجمع قيادات الأحزاب و مقراتها، ولذلك كانت لقاءاتهم و مشاوراتهم أمرا عاديا، وكنا نلتقي إسبوعيا بقادة الحزب الوطني، والحزب الوطني التقدمي، والحزب الشيوعي والقوى الأخرى التي تسعى لبناء الجمهورية، نتعاون ونتناقش ونعمل سوية.

وشكل آخر من أشكال النضال السياسي للبارتي كان المشاركة في المنظمات المهنية العراقية مثل، نقابات المحامين والإقتصاديين والمهندسين والمعلمين والصحفيين الذي كنت ممثل الحزب في مجلس إدارتها. كما حاول البارتي تأسيس منظماتها الخاصة للطلبة والشباب والنساء، ولكن للأسف فشل في ذلك لأنه إصطدم بعقلية عبدالكريم قاسم الشعوبية إضافة الى محاربة الحزب الشيوعي لتلك الجهود وشن حملات كبيرة ضد تشكيلها و إعتبارها محاولات لبث التفرقة وتمزيق الصف الوطني و

ص 11

تتمة : حوار العمر مذكرات الرئيس جلال الطالباني (الحلقة ١٧)

و خدمة أعداء الجمهورية.

وفي الحقيقة رغم أن الحزب الشيوعي وقع في تلك الفترة إتفاقا سياسيا مع البارتي و اعترف بالحكم الذاتي، لكنه للأسف عارض و حارب مطالبنا القومية. فعلى سبيل المثال، طالب حزبنا بتأسيس مديرية معارف كردستان، ولكنهم وعلى سبيل السخرية والاستهزاء كانوا يقولون "معارف قلياسان". ويتهكمون على كلمة كردستان والمطالب الكردية رغم ذلك الاتفاق الذي كان يفرض عليهم أن يحترموا توقيعاتهم عليه.

وفي الأساس كان التعاون الثنائي بينهم وبين حزبنا بناء على طلبهم، حتى ان ذلك غير بعض شعاراتنا، فالحكم الذاتي أصبح بديلا عن الإتحاد الفدرالي، حتى شعار حق تقرير المصير تغير أيضا. وكان ذلك تحولا كبيرا في سياسات البارتي، لأن البارتي يدعو الى حق تقرير المصير والدولة الفدرالية والكونفدرالية، فإذا به ينزل الى شعار الحكم الذاتي. ويبدو أن التحليلات في تلك الفترة تتجه نحو كون العراق جمهورية لكل الكرد والعرب، وكون العراق هو قلعة ضد الإمبريالية والرجعية في المنطقة، ولكي نحافظ على هذه الجمهورية علينا أن نغير سياستنا وأن نتنازل عن بعض مطالبنا لكي نتمكن من العيش في ظل الجمهورية ونحقق أحلامنا فقط في إطار الحكم الذاتي.

إن عودة شعار الحكم الذاتي الى الحركة التحررية الكردية كان بسبب ثورة ١٤ تموز و بالأخص نتيجة الضغوطات و المواقف السلبية والمجحفة للحزب الشيوعي العراقي، ويبدو أن الملا مصطفى بدوره كان يتحدث ضد كردستان وحركتها التحررية. فحين عاد الملا مصطفى من الإتحاد السوفيتي أشار في خطابه للمستقبلين "نحن جميعا عراقيون، كلنا أخوة لا فرق بين العرب والكرد ولا بين المسلم والمسيحي، كلنا جنود للزعيم عبدالكريم قاسم". وفي مناسبات عديدة أخرى يقول "كل مطلب يؤدي الى الإنفصال والخلاف، يبث الفرقة بين العراقيين". حتى أنه حين زار مدينة السليمانية وإلتقى بوفد الطلبة والشباب والنساء قال "لماذا هذه التفرقة، نحن لانحتاج الى منظمات طلابية أو شبابية، كلنا عراقيون"؟!

لقد وصل الملا مصطفى بتصوراته حول الأخوة العربية الكردية الى حد أنه لم يكن يقبل بطرح أي مطلب تشم منه رائحة الإنفصال وحين وصل الأمر الى حد طلب الإجازة الرسمية للحزب كان الملا مصطفى يقول "ليس شرطا أن يلحق إسم كردستان بالحزب."

هذه المواقف من الملا مصطفى من جهة، ومواقف الحزب الشيوعي وضغوطاته من جهة أخرى، أضف إليها شعوبية قاسم أدت بمجملها الى تغيير الشعارات القديمة للحزب، وطرح شعارات تلائم الوضع الجديد في العراق. وهكذا إندمجت منظمتا (إتحاد الشباب الديمقراطي الكردستاني وإتحاد شباب العراق) في منظمة واحدة وسميت بـ "إتحاد شباب العراق"، وشاركا معا في أول مؤتمر للشبيبة في صيف عام ١٩٥٩.

*** وماذا عن علاقات البارتي بالدول الإشتراكية؟**

–كانت للحزب علاقات مع معظم سفارات الدول الإشتراكية المعتمدة في بغداد، وكانت هناك عزائم و ولائم متبادلة، وكانت صحفنا تنشر أخبار هذه الدول، وخاصة أن الحزب إهتم كثيرا بما يحدث في الإتحاد السوفيتي والصين في تلك الفترة. وكانت أخبار ألمانيا الديمقراطية لها الأهمية القصوى عند الحزب لأن العراق لم يعترف بها بعد ولها قنصلية في بغداد، وكنا ندعو في تغطيتنا الخبرية و مقالاتنا الى ضرورة الإعتراف بها، وهذا الموقف أدى الى علاقة متميزة مع ألمانيا الديمقراطية و لهذا وجهت ألمانيا دعوة الى الأستاذ إبراهيم أحمد لزيارة برلين الشرقية، الى جانب ذهاب وفد من حزبنا برئاسة عمر دبابة الى هناك بإسم أنصار السلام.

وقبل أن يحصل الحزب على الإجازة الرسمية، فتح الحزب العديد من المقرات تحت غطاء مكتب جريدة (خبات) في جميع أنحاء كردستان، وكانت تلك المقرات في الحقيقة هي مقرات حزبية وليست صحفية، حيث كانت الإجتماعات الحزبية تعقد هناك ويمارس الحزب نشاطاته فيها، ولم يكن بالإمكان طبعا أن نضع لافتة بإسم (الحزب الديمقراطي الكردستاني) على واجهة تلك المكاتب، لذلك أخفينا العنوان وجعلناه مقر جريدة (خبات).(

تطور النشاط الحزبي وإنضم اليه آلاف الناس عن طريق المنظمات الحزبية كالشباب والطلبة والنساء وغيرها، ونشط الحزب خصوصا في أوساط الفلاحين وبذلك أصبحت إتحادات الفلاحين خالصة للحزب، و نجح ممثلو الحزب في الإنتخابات بدعم الجماهير، هذه الإنتصارات كانت مهمة جدا خاصة و سط الفلاحين لأن المجتمع الكردستاني كان يتشكل معظمه من الفلاحين، و نستطيع القول بأن الحركة الوطنية كانت بالأساس حركة فلاحين، وكان جزءا مهما من الطبقة الفلاحية واقعا تحت تأثير الحزب الشيوعي، مع ذلك كان مرشحو حزبنا يفوزون غالبا بتلك الإنتخابات في معظم المناطق، وعليه فإن تأثير الحزب بدا واضحا جدا فى فلاحي أربيل و السليمانية و الى حد ما فلاحي كركوك و الموصل.

كان النشاط الحزبي محصورا آنذاك بإجتماعات الحزب مع المواطنين من فئات المجتمع وتنظيمهم، كما كانت هناك تجمعات كبيرة في المناسبات الوطنية و القومية، مثل عيد نوروز و ذكرى تأسيس الحزب و ثورة بارزان وثورة ١٤ تموز والإنتفاضات العراقية الوطنية، وكان ممثلو الحزب يلقون في تلك المناسبات الوطنية والقومية خطبا يعبرون فيها عن مواقف وسياسات الحزب. وكان لمقرات الحزب دور في جمع المواطنين، منها مقرات الحزب في بغداد وفي أوساط الكرد الفيليين وإشراكهم في المناسبات الوطنية وأعياد نوروز القومية. وجدير بالذكر أن عبدالكريم قاسم كان يشارك بنفسه في تلك الإحتفالات في السنتين الأوليين، ويلقي خطابا فيها، وكان يستقبل بحرارة، وتحول عيد نوروز في عهده الى عيد الربيع على مستوى العراق.

كان الحزب يدعم في تلك الفترة عقد علاقات جيدة وممتازة مع جميع الأحزاب والقوى العراقية والتعاون معها، ويسعى في الوقت ذاته الى التقريب فيما بينهم، ولكن مواقف الحزب الشيوعي أدت الى إبتعاد حتى الحزب الوطني الديمقراطي عن هذا المسار. لم تكن علاقة الحزب الشيوعي مع هؤلاء جيدة وكانت هناك خلافات بينهم وبين الحزب الوطني والحزب الوطني التقدمي ومع النقابات، وكان الحزب الشيوعي هو من أساء الى تلك العلاقات، فحين أعلن الحزب الوطني الديمقراطي وقف نشاطه السياسي، قام الحزب الشيوعي بفصل مجموعة صغيرة منهم وإدعى بأن هؤلاء يمثلون الحزب الوطني ونشر بيانا بإسم "الحزب الوطني الديمقراطي يواصل نضاله "جعل هؤلاء هم الوطنيين الديمقراطيين، لكن أصلاء الحزب رفضوا ذلك.لقد فعل الشيوعيون مثلما فعلت الدول الإشتراكية بلجوئها الى صنع أحزاب كارتونية، أراد الحزب الشيوعي أن يخلق أيضا مثل هذه الأحزاب الموالية له حتى قبل إستيلائهم على السلطة، حتى أنهم حاولوا تقديم همزة عبدالله ونزاد وخسرو الى المؤتمر و وصفهم بأنهم الأصل في حزبنا.

ŞEVA QETLA GİRAN

Ewrê çev sût,çev û birû mîna xwe her car bi kilê Sibhanî kil-dabû,stêyrkê goveka ezmîn ketibûne govendê. Her çîya û banîya xulexula avkanîyabûn, dora kaniya hev kombibûn şarûr û bilbil, şirîn-şirîn ketibûne sohbetê, haj bay dinê tûnebûn, wekî çend sehet şûnda ba û bahoza zulma giran rûyê erş û kursî wê xêlîya reşva were xemlandinê.

Însanet ketibûne xew û xewnêd şirînda, pey karê nav rojê kesirî serê xwe danîbûn wekî rehetbin. Çawa şîrqînîya birûskê dor gunda girtin, dengê çek û sîliha, şaşo-paşo kesî tê dernex-ist çi qewimî û çi diqewime.

Xwîna gelê me bûne behrên bê deng, qîz û bûkên me diricifîn nava lepên neyarada, kesî guh nedida daxwezî û hêwirza dayîka, kuştin bav û bira, kal û pîr.

Wêrankirin axa meye pîroz, hewar û gazin pervedibû dev û dorê gund û bajaran lê bêfeydebû, hova karê xweye qirêj pêjda dibirin,dikuştin, didzîn, serî jêdikirin.

Kerrbû dinîya xapînok, tû kesî gohê xwe nedidane ser lûbîn û zêrînê daykên me. Ber zulma reş êzdî direvîyan, lê ewanajî nizanîn boy çîye sûcê wan û guhnê wan.

Tîrêja royê rengê xwîna sorgevezva binê ewrê reşda serê xwe derxist, şerma serî berjêrkir, şûr û kêrên destên hov û neyara nihêrî, lê çare tunebû biba alîkar wanra.

Her dera meytê cangorîyabûn, her dera qîrîn û hewarbû, zulm, zulmeke pir giranbû.

Nivîskar û Helbestvan: Hinara Tajdîn

Diyarî ji bo xwendevanan

Pêşverû

DEZGIRTIYA XORTAN

Xemlandî me seranser
dezgirtiya xorta me
Gerden sêvek sor û zer
li hêviya merda me
Qelen xwîn e ne gewher
Kurdistana kurda me
Bê tang û top û leşker
îro we ez berdame
Kurdistana delalim
herkes tê min dixwazî
Ez pir şox û şepalim .
min deng daye bi nazî
Ev bûn bîst û du salim
li ser min cengebazî
Kurdo wer min bixwaze
belê bi serfirazî
Rabe ser xwe binêre
hawîr me tev neyarin
Li topan guh bidêre
li ser me ber dibarin
Dijmin li jor û jêre , ji cengê re li karin
Kundên serê şikêra nêçîr ji ber te xwarin
Îro roja xebatê
serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê
li kû maye soza we
Hûn tev şêrên di latê
rovî kete koza we
Şikestî ne di matê
dijmin birye doza we
Şev û rojan bixwînin
bibin serbest û zana
Tovê jînê biçînin
ji bo dîl û nezana
Carek hûn dê bibînin
van bexçe û rezana
Kurdistanê derênin
ji destê van dizana
Çavên di reş me kil dan
li ser bana rawestan
Tox û ala me hildan
baqê gulan li destan
Sirme , nîşan li mil dan
pişt û kember me bestan
Me sed awir li dil dan
xortino werin Kurdistan

Cegerxwîn

Konê Reş : Rojnameya Ummîd û kovara Hawar

Mîr Mihemed Salih Bedirxan û rojnameya Ummîd û Yekbûn:

Mîr Mihemed Salih Bedirxan (1915 - 1874), bavê Rewşen xanim Bedirxan e. wî jî baş bi-zav û çalakî di ber kêşeya kurdî û rojnamegeriya kurdî de kiriye.

Wî jî wek pismamên xwe du rojname weşandine: Yek li Qahîre bi navê Ummîd (1900). Ummîd: Rojnameyek 15 rojî bû, cihê weşandina wê li Qahîra bû, hejmara (1) ê di Îlona 1900an dê çap bûye. û yek Stenbolê bi navê (Yekbûn).

Yekbûn (1913): Rojnameyeke kurdî û tirkî bû, hefteyê du caran li Stenbolê dihat weşandin.. Erê.. Xwedî û berpirsyarên wan Mîr Mihemed Salih Bedirxan bû.

Mîr Celadet Bedirxan û kovara Hawar û Ronahî:

Bi saya Mîr Celadet Bedirxan yekemîn care di dîroka kurdan de ku zimanê Kurdî bi tîpên latînî di nav rûpelên kovara HAWARê de li Şamê berdest dibe.

Hejmara pêşî ji vê kovarê di 15 Gulana 1932an de hatiyeçapkirin, hejmara dawî (57) di 15 Tebaxa 1943an de derketiye. Di sala 1942an de jî, Mîr Celadet Bedirxan, kovareke din, ew jî bi alfabeya latînî, bi navê RONAHÎ li Şamê weşandiye..

28 hejmar ji vê kovarê jî hatine çapkirin, hejmara dawî 28 di sala 1945an de derketiye..

Konê Reş

Qamişlo, 21.04.2025

SALIH HEYDO : ŞÎRETA DIYA MIN

Di sala 1967 an de ez di refa pêncê Seretayî de bûm dema bû bergiya cejna Qurbanê diya min kar û barê xwe kir ku ji gundê me Hesê Ûso here Gundê Marîtê serdana mala bapîrê min ji bo cejnê,lewra destek cillên baş di gel pêlavek çermîn ji min re kirrî bû û çend diyarî jî xistibûn buxçika xwe ji bo bi dest xwe re ji zarokên xalan û xaltîkên min re bibe,her wiha weke tê bîra min em berî cejnê bi du rojan çûn Marîtê.

Devera Amûdê ku di sînorên,Dugurê,Gundor,Ey n E'mşa,Çetelê û Şêqnê de bû,Her wiha gundê ku em di wan re derbas bûn ev bûn: Xirbê kejê,Qizilkendê,Terzî,Hetlo, Çoxreş ,Girê

kujtiya Elîgoranê û Şêqnê bûn çiku dema em bi erebeyê gihajtin gundê Şêqnê pirraniya siwarbûyan peya bûn û berê xwe dane ser girê gund da herin serdana gorra Şêx Ûnisê Qinîyê Zolî ku pir bi nav û deng bû û Ûcaxzadeyekî pîroz bû,lewra dema daketin di dews de berê xwe dane malgorra wî û fatîhe xwendin.

Piştî xwendina fatîheyê berê xwe dane ala ber serê wî ku bi cawekî kesk bû û heçiyê/a hebû dest avêtin wî çawê kesk yê pîroz ku ji xwe re perçeyekî yan zîtolekî jêkin û weke nîşaneke herî pîroz didîtin bi înan û behwerî.Her wekî tê bîra min diya min perçeyek jê birrî û kire du ker yek jê ramûsa û kire bêrîka xeftanê xwe û yê dîtir jî di bin bestekura min ya qemîs de li qirrika min pêça!

Dema min ev riftar dît ez seyr û matmayî mam û min ji diya xwe pirsî ku ev çiye û çima wî paçê kesk jê dikin û maçîdikin,qey çi heye?!

Diya min li min vegerrand û got: Kurê min ev keska ziyaretgeha Şêx Ûnis e ku ji mezintirîn û pîroztirîn Ûcaxzadeya ye,kesê bên ser gorra wî û keska wî ramûsin yan bibin malê bi destûra xwedê û pêxember û lavijê wî astengiyê nabînin û timî di xêr û xweşî û saxlemiyê de dijîn û rêya buhiştê li ber wan vekiriye!

Her wiha hemiyan ji xwe re ji wê keskê birrîn û birin û pişti wê gorra wî û axa derdorê ramûsan û bi rêz û rûmeteke pîroz xatir jê xwestin û hatin li erebeyê siwar bûn.Lê berî em bigihêjin gundê Marîtê mala bapîrê min diya min çend şîret li min kirin û got: Kurê min divê tu gelekî bi tore û sinçî tevbigerre û heger tu çû nav zarokên gund jî bera hayê te ji te hebe,gelekî bi wan re nede û nestîne û li xwe û cillên xwe miqate be û di sibeha cejnê de jî bi zarokan re li nav malê gundiyan li şekir û tamitîtka negere da xelk li ser te nepeyivin.

Tenê di mala bapîrê xwe de be û tu û zarokên xalanên xwe bi hev re bilîzin û suhbetê bikin,bera zarokên gundiyan bên cem te çiku tu mêvanê gund e û şikir ji xwedê re tu ne kêmî tiştekiye.Bi rastî dema diya min wilo got ez hinekî di dilê xwe de xemgîn bûm çiku ez hatime gundekî ku di cejnê de li nav malên wan bigerrim û wan bibînim,Lê tev bêdiliya xwe jî min pabendî bi gotina diya xwe kir û ez ji mala bapîrê xwe ji nav xal û xaltîkên û zarokên wan derneketim û ez timî di himbêza wan de bûm bi delalî û ramûsanan.Her wiha Gundê Şêqnê li devera Amûdê ye û şêniyên wî ji hoza Gabara ne.

Malbata mala Mihemed Salihê Elî Sêwî ne û gorra bapîrê min ji hêla bavê min Hecî Mihemedê Sima'îl jî li wî giriye ku di sala 1935 de çûye ser heqiya xwe.Lewra bîrhatineke pir xweş bû çiku ew cara pêşî bû ku ez di ewqa kundên kurdan yên welêt re, di devera Amûdê re derbas dibûm ku her tişt bi kurmancî bersiv dida.Lewra dema em vegerriyan malê û me rojên cejnê li Marîtê qedandin bapîrên min cerek tije hingivê mêşdanên kewarê malê kir û bi diya min re şand.

Xalê min jî tirêla avête dû terektorê û em û hin ji kufletên mala bapîrê min hemî ketêne û lê siwar bûn û me berê xwe da gund heya em gihajtin Hesê Ûso.

Dûmahî : Efrîn_di_bin_dagîrkeriyê_de (327) :

û li gund jî xerabûn û bendên axî û bombe hene; Û mixtêr bangewaziya dîtina çareseriyekê ji vegera xelkê gund re, û jiholêrakirina bombeyan ji nav gund û erdên wê de ragihand.

Û li 01.08.2025an. Z, rêvebirê ragihandinê ya rêbertiya Herêma Efrînê ya niha got: "Ji heft salan ve, xelkê Gundên Basilê, Çê, Derwîş û Şêxorzê Jor, ji ber hebûna Bargehên Turkiyê tê de nikanin vegerin malên xwe, û bi ser wan daxwazên dubarekirî yên çareserkirinê, dîsa jî ev gund li pêş xelkê wan girtî man. Îro, û bi şopandinek yekser ji rêvebirê herêmê birêz Mesûd Betal ve, em tekez dikin ku ev dose li ser riya çareserkirinê ye, û bi ya Xwedê nêzîk dê xelkê wan gundan vegerin gundên xwe."

Ü me jî di dehan raporên ku di van heft salan de belavkirî weha nivîsandibû: "Artêşa Turkiyê bû sedema koçbarkirina tevaya nişteciyên pênc gundan, û ji dagîrkirinê ve li Avdara 2018an. Z û ta niha vegera xelkê wan gundan qedexe dike, û ew gund ev in: ("Basilê" û "Cilbirê û çandingehên pê ve girêdayî" li Çiyayê Lêlûn, "Dêrwîş" û "Çê" li Navça Reco, "Şêxorzê Jorin" li Navça Bilbilê), û ev pirose tewaneke li dijî mirovahiyê ye, û ji Zagona Navdewletî ya Mirovahî re berevajîkirineke bi robet e."

Girtinine tewşankî:

Di navboriya heyva Pûşperê ya borî de, hejmarek xelkê Efrînê yên ji bêtirî heft salan ve girtî û zorane veşartî ji hepsên Dagîrkeriya Turkiyê derketin, çi bi revê tevlî hinek din ji herdu hepsên Bajarokên "Çobanbegê/El'ra'î" û "Mari'ê", piştî basmîşkirina wan ji aliyê giropin çekdar û hin kesan ve, li piştî roxandina Rijîma "El'esed", an piştî pêşkêşkirina wan bo dadgehin rûcesneyî ji bo girtina doseyên wan, an jî piştî dawîbûna cezayên wan di hepsên Turkiyê de, ji wan: "Newaf Welîd Elo /35/sal ji Gundê Dumiliya - Reco, Doxan Mûrad Îsma'îl /30/ sal ji Gundê Hebo - Navça Mabeta, Îsma'îl Mihemed Hemreşo /27/sal ji Gundê Kaxrê - N. Mabeta, Bekir Ebdîn Hebeş /35/sal ji Bajaroka Be'idîna - N. Reco."

Lê, ta niha bi dehan ger em nebêjin bi sedan -tu serjimareke hûrgulîn peyda nabe- çarenûsa wan nediyar e, jê: "Ehmed Mehmûd Hemo/Ebo Cebel /40/sal ji Gundê Dumiliya - N. Reco, Xelîl Ebdîn Hebeş /45/sal ji Bajaroka Be'idîna - N. Reco, Fewzî Hemîd Hemze - zayîna 1976. Z ji Gundê Goliya Jêrin - N. Reco, Hemze Şe'iban Ibrahîm - Zayîna 1992. Z û xwîşka wî Asiye ji zayîna 2002. Z ji Gundê Xelîlaka - Navça Bilbilê, Ehmed Şêxo kurê Seydo /28/sal ji Gundê Kêla - N. Bilbilê, Nûrî Ibrahîm Cabo /43/sal ji Gundê Qirigolê - N. Bilbilê, Riyad Arêf Cabo /45/sal ji Gundê Kaxrê - N. Mabeta."

Û ta niha girtiyin Kurd di Hepsa Maratê ya navendî de li Efrînê bi tewana têkildariyê bi "Partiya Yekîtî ya Demokrat PYD" re hene, ji wan: ("Mihemed Ehmed Seyid, Mihemed Mistefa Binefşê" ji xelkê Bajaroka Celemê - Navça Cindirêsê, "Ednan Ebid El'rehman" ji Gundê Keferzîtê - Navça Navenda Efrînê).

Û hinek ji koçberên Efrînê li dema êrişa bi ser "Herêma El'şehba" ve - Gundewarê Heleb a Bakur an jî li dema vegera hinek ji wan bo herêmê hatin girtin, ji aliyê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ve, û bo hepsên Ezaz, Mari'ê û Çobanbegê/El'ra'î hatin şandin, û çarenûsa wan nediyar e.

Û li 09.07.2025an. Z, giropeke ji Istîxbaratên Turkiyê û Milîseya "Asayêşa Sivîl li Mabeta - El'siyasiyê" rabûn Hemwelatî "Heyder Seydo kurê Bekir /63/sal" ji mala wî li Gundê "Şêxûtka" tevî kurê wî (yê ku piştî çar rojan hatiye berdan) girtin, û ta niha "Heyder" bêsûc girtî ye, û ew berê jî carekê hatibû girtin.

Û li 09.07.2025an. Z, Asayêşa Giştî/ El'emin El'am Hemwelatî "Hesen Isma'îl Ehmed /48/sal" ji xelkê Gundê "Memala" - N. Reco girt, û ew radestî bermaya Milîseya "Asayêşa Leşkerî" ya girêdayî Istîxbaratên Turkiyê kir, bi sedema derketina wî ji Hepsa "Mari'ê" li dema basmîşkirina hepsê ji aliyê xelkê bajarokê ve, piştî roxandina rijîmê, û ew bêtirî sal û nîvekê tê de girtî bû, piştî derkirina wî û malabatê ya zorane ji Turkiyê, û ta niha ew bêsûcane girtî ye.

Şewatên daristanên îhracê:

Ji ber kombûna bermaya darên îhracê ya pir û yên ku di navboriya salên borî de, ji aliyê milîseyên Dagîrkeriya Turkiyê ve hatine qutkirin, li 23.07.2025an z, agirek mezin bi daristaneke di navbera herdu Gundên "Erendê û Tirmûşa" de - Navça Şiyê ket, û rûbereke fere daqultand; Û "Berevaniya Sivîl a Sûrî" tekez kir, ku tîpên wê bi hevkariya çalakiyên xwecihî û xelkê kanîn piştî /18/katan ji kar vemirandana.

Û "Berevaniya Sivîl a Sûrî" dîsa tekez kir, ku tîpên wê li roja Yekşemê 20.07.2025an. Z, şewatek li Çayê Gundê "Hechesna" - N. Cindirêsê jî vemirandin.

Binpêkirinine din:

-Dora deh malabatan ji bermaya çekdarên Milîseyên "Ceyş El'nuxbe" li Gundê "Şêxûtka" - N. Mabeta hene, ew venagerin herêmên xwe yên resen, razî nabin ku malên malbatên vegerîne gund radestî wan bikin, xelkê gund aciz dikin, û aşkere dibêjin piştî ku ew werza zeytûna ya were têra xwe bi dest bixin paşê ewê biçin; Ji wan "El'eqîd Ebo Cum'e."

-Li vê dawiyê, berî barkirina hejmarek ji malbatên anîndeyan bo herêmên xwe yên resen, wan tevahiya tişmiştên malên van hemwelatiyan "Henîf Mihemed Kurdî, Henîf Horo, Wehîd Mihemed Umer, Xelîl Umer" li Gundê"Me'imila" - N. Reco (yên ji sala 2018an. Z ve desteserkirî) dizîn û talan kirin.

-Li 24.07.2025an. Z, giropeke çekdar rabû giropeke zayenda elektirîkê ji mala Duktor "Adêl Zênel" li Gundê "Tilifê" (yê girêdayî Navenda Bajarê Efrînê) dizî.

Nesipîkirina hepsan ji girtiyên siyasî û bi tuhmetên têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser (RX) a berê re, û ne aşkerekirina çarenûsa yên zorane veşartî ji keç û lawên Efrînê ji bêtirî heft salan ve, tersî karê "destlata demkî ya guhêzek" yê ku bi hepsên din re kiriye, û herweha tersî ragihandina wê ji vekirina rûpeleke niştîmanî ye nû re ye, û ji Zagona Navdewletî ya Mirovahî re berevajîkirineke bi robet e.

.٠٢،٠٨،٢٠٢٥Z – 2637. K

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Efrîn_di_bin_dagîrkeriyê_de (327) :

Dijatiya li ser sivîlina, pênc gundên koçberkirî û qedexekirî li ser xelkê wê, hin girtin û yên çarenûs nediyar, şewatên daristanên îhracê, şelandin û dizîn

Ji nû ve bi navkirina piraniya serokên encûmenên xwecihî yên berê li Herêma Efrînê weke serokên şarederiyan, bi ser de jî hîştina piraniya endam û karmendên wan encûmenan di cihên wan de, mîna tevlêkirina piraniya endamên Milîseya "Asayêşa Leşkerî" ya berê û çekdarin din di nav Amûra "Asayêşa Giştî/ El'emin El'am" de (ew govdeyên ku berê girêdayî Dagîrkeriya Turkiyê bûn), û ew jî di çarçewa pilana girêdana dezgehên herêmê bi Parêzgeha Heleb ve, digel berdewambûna karê Milîseya "Asayêşa Sivîl" û movikên ewlehiyê di nav bermaya Milîseyên "Artêşa Nişтîmanî ya Sûrî" de, û girêdana wan jî bi Istîxbaratên Turkiyê re (yên ku ta niha doseya ewlehiyê kontirol dikin), û herweha jî bi sedema mandina bargehên leşkerî yên Turkiyê û qedexekirina vegera xelkê pênc gundan bo cî û warên wan, û neberdana "Wîlayeta Hetayê ya Turkiyê" ji rêbertiya herêmê ji sala 2018an. Z ve bi awakî fermî...Ev bûyînên tekezbûyî nîşanên berdewamkirina Turkiyê ji dagîrkirina herêmê re ne, û herweha jî kendkirina wê ji cîbicîkirina hevpeymana El'şer'i - Ebdî û peydakirina jîngeheke aram ji bo vegera koçberên wê re.

Ev jî bûyînin li ser rewşên serwerkirî ne:

Birînkirina sivîlekî bi qurşînê:
Li êvara Înê 01.08.2025an. Z, li gor jêderine ragihandinî yen xwecihî, anîndeyekî ji Bajaroka "Ebo Dihor" - Gundewarê Idlibê ya Başûr Rojhilat bi navê "Mazên El'mehmûd"
qurşîn avêtin Hemwelatî "Gîvara Ehmed Hesen /30/sal" ji xelkê Gundê "Coqê" (yê girêdayî Navenda Efrînê), di dîkana wî de li gund, û bi kûranî birîndar kir, nemaze jî di lingê wî yê rastê de, ji ber wê jî hate xwestin ku bo "Nexweşxana Sûrî ya pisporî" li Efrînê were rêkirin, û li dawiyê jî tewankar reviya; Ew jî ji ber daxwazkirina "Gîvara" bi dênên dîkana xwe yên li ser "Mazên" kombûne, û rawestandina firotina wî bi dên.

Dijatiya li ser sivîlan:
-Li 08.07.2025an. Z, dema valakirina sîtêra avê ya li dû direktora wî ya çandiniyê ji maleke li paş avahiya "Rêbertiya Asayêşê" re li Bajaroka Reco, Ajovan "Zekeriye Elî Hemkî /28/ sal" ji xelkê Gundê "Etmana" - N. Reco tûşî lêxistineke mekin û avêtina fîşekan ji dabancakê bû, li ser destê sê xortên çekdar ji anîndeyan, û di encamê de hejmarek parsiyên wî şikiyan û govdeyê wî jî bi hin ciyan derizî, û ew jî bi behaneyeke çêkirî, û bûyer bê lêpirsîna dijkeran an jî sekinandina wan derbas bû.
-Li êvara 10.07.2025an. Z, li dema vegera wî ji erdê xwe yê li rex "Kaniya Batmanê" - Çemê Reş, li rex çateriya Gundê "Kumreşê" li ser riya Reco, sê çekdarên serçavgirtî bi cilên "Asayêşa Giştî/El'emin El'am" û li ser matoreke dutekerî rê li pêş Hemwelatî "Mihemed Şêxmûs Yûsêf /40/sal" ji xelkê Gundê "Etmana" - N. Reco girtin, û qurşîn bi kilaşinkovê di nav lingan re avêtin, sekinandin û mekin lêxistin, matora wî ya duloqî û xilyewîk û tibabeke diravî jê dizîn, û paşê jî reviyan. Û "Şêxmûs" giliyek pêşkêşî " El'emin El'am"kir, lê bê encam bû.
-Li şeva 12.07.2025an. Z, du diz ketin mala Hemwelatî "Mihemed Qedîb El'ban kurê Elî /30/sal" (ê ku li kêlek bira û xwîşka xwe razayî) li Bajaroka Reco, û "Mihemed" hişyar bû û bi herdu dizan re pevçûn kir, û di encamê de kêrek di destê wî de lêket û govde bi hin ciyan derizî, û li dawiyê diz reviyan.
-Li 13.07.2025an. Z, anîndeyin ji Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" rabûn li Bajaroka Şiyê li Temenmezin "Reşîd Mihemed Çolaq /60/sal" xistin û ji rûmeta wî daxistin, ji ber ku wî dênên dîkana xwe yên li ser yekî ji wan kombûne xwestin, ewê ku razî nedibû bide.

-Li êvara 22.07.2025an. Z, li nêzîk çateriya Gundê "Eltaniya", li dema vegera wî ji Gundê "Bilêlko" (yê hevcîwar ji gundê wî "Memala" re li Navça Reco), çekdarina bi cilên "El'emin El'am" û li ser matoreke dutekerî Hemwelatî "Mehmûd Elî Isma'îl /45/sal" sekinandin, piştî ku fîşek di derdorê re avêtin, û ew û zarokê wî neçar kirin ku derbas daristaneke îhracê bibin, ew girêdan û mekin lêxistin, matora wî ya duloqî û xilyewîk û tibabeke diravî jê dizîn, û paşê jî reviyan.
-Li êvara 24.07.2025an. Z, du çekdaran bi navê "El'emin El'am" li ser matorekê rabûn Xort "Nîzar Mihemed Êhmo /20/sal" ji xelkê Gundê "Çeqmaqa" - Navça Reco sekinandin, di navêna herdu çateriyên Gundên "Çeqmaqa" û "Çençeliya" de, li dema çûndina wî bo rezê xwe ji bo payandinê, û fîşek avêtin derdorê û bi qundaqê lêxistin, û matora wî ya dutekerî û çekeke awê û xilyewîk û tibabeke diravî jê dizîn, û paşê jî reviyan.

Pênc gundên koçberbûyî:
Di navboriya herdu rojên borî de, rûpelên hevgîhana civakî pêşberîkek/me'irodek bi navê "keyayê Gundê Basilê - Mihemed Hesen Miqdad" -ew li Bajarê Efrînê rûdine- û bi dîrok 13.07.2025 Z belav kirin - me rastiya wê tekez kir, ew pêşberîk ji "birêzên têkildar bi wê mijarê û yên kanin alîkariyê bikin" re hatibû rêkirin, û tê de zehmetkêşiyên xelkê gund ên ji sala 2018an. Z ve koçberbûyî û ta niha li nav gundên derdorê û herdu Bajarên Efrîn û Heleb û yên din mişextbûyî tê şirovekirin, bi sedema hebûna Artêşa Turkiyê tê de, û herweha ew çend carên ku ji hewildanên vegera gund hatine qedexekirin, di heman dema ku bi rengekî bêwijdan pez di nav erdên wan de têne çêrandin, herweha ew ji belengaziyê dinalin û bê cî û war in, **û li**

Rûpel 15

Îmad Ehmed : Bi Mam Celal re, xewn û xemek

Geliyê Xwakurkê li devera Bradost a bajarokê Sîdekanê ye, nêzîkî sêgoşeya sînorî ya navbera (Êraq-Îran û Tirkiyê) ye û ji rêzeçiyayan û lûtkeyên bilind pêk tê. li gundê (Bine) dest pê dike heta gundê (Xizne) nêzîkî sêgoşeya sînorî, di ware erdnîgarî, ew deverek çiyayî bû ku ji bo çalakiyên Pêşmergeyan guncaw bû. Destana Xwakurkê di payîza 1988an de, ku hejmareke mezin ji Pêşmergeyên Eniya Kurdistanê têde beşdar bûn, zêdetirî mehekê dom kir û artêşa dagirker a Baasê têk çû. Birêz Mesûd Barzanî bi xwe şer birêve dibir.
Ew dever xwedî bedewiyeke xwezayî ya degmene, di havînê de ew bihuştek li ser erdê ye, çiya û geliyên tijî dare, av û hewaya paqij û zelal e. Di zivistanê de, berf, qeşa, dijwar û bê hatin û çûne.
Baregeha serkirdayetiya Partiya Komunîst a Êraqê li binê çiyê li aliyê çepê yê Geliyê Xwakurkê li nêzîkî Jerciyan bû. Tevî zehmetiyên jiyana li gorî çêj û bernameyên xwe, wan ji xwe re bihuştek dinyayî ava kiribû. Di wê demê de, ew û em Marksîst dixwestin bihuştek li ser erdê biafirînin, berevajî tevgerên din. Îxwan El-Muslîmîn û tevgerên Îslamî yên Şîe û Sunî dixwestin bihuştê li wê dinyayê bibînin!
Di wan serdeman de, me çend caran ji bo civînan serdana serokatiya Partiya Komunîst a Êraqê kir. Di quntara çiyê de baregeha (Ebû Tara) hebû, ku berpirsiyarê mêvandarî û organîzekirina civînan bû, li wir cara yekem çavê min bi (Ebû Hikmet - Yûsif Hana Yûsif) û dîya wî (Bahar) û Ebû Farûq -Omer Elî Şêx) û (Ebû Şehab -Rehîm E`cîne) ket, yad û bîreweriyên wan bixêr be.
Ax, ez çiqas ji wan fêrî jiyana dinyayî û reftarên wan ên mirovî ên hêja bûm, me roj û şevên xwe bi dengê avê, bayê, pelên darên beruyê, livîna sivureyan û xwendina çûkan û teyrikan şiyar dibûn.
Bavê Tara (Îbrahîm Sofî Mehmûd) mirovekî wêrek, gotin xweş, xweşcivak û zana şarazayê deverê bû, rengê wî yê genimî û bejn û bala wî ya bilind û mil pan û xwediyê zendên stûr bû.
Ew demek dirêj bi Partiya Demokrat a Îranê bû, bi rizamendiya serokatiya Partiya Komunîst a Êraqê alîkarî û hevkarî dikir, heta wê astê ku ew bû yek ji fermandarên leşkerî yên payebilind ên wê partiyê. Lingê wî yê rastê bi fîşekê hatibû birîndar kirin, ew nikaribû bimeşe û dikûlî, û dema ku ew rûdinişt ew nikaribû lingê xwe bitewîne û dirêj dikir.
Di havîna sala 1986an de, dema ku em di bin kepra wî rûniştibûn, pirsek hat bîra min û min xwest bersiva wê ji ew serkirdeyê şareza û xwedî ezmûn û baldar bizanim, çûnkî ez bi dîdara Dr. Ebdulrehman Qasimlo şad nebûm û nebû nesîb, min xwest bizanim ka cudahiya di navbera Mam Celal Talebanî û Ebdulrehman Qasimlo de çi ye?
Wî bi zimanê xwe yê şîrîn gotî: "Hevalo, ev her du zilam du rêberên mezin, bi şiyan, jêhatî û zîrek ên Kurd in. Ew xwedî rewşenbîrî û pir ezmûn in, lê cudahîyên wan hene." Got jî: Mam Celal di siyasetkirinê de taktîk û stratejiyên xwe eşkere ne, meriv zû jê têdighê û meriv dizane çi dixwaze?. Lê belê berevajî wê, demek pêwîste ku meriv bizane Qasimlo çi dike û çi dixwaze.
Mixabin, Qasimlo di 13ê Tîrmeha 1989an de li Viyanayê bi destê xedrê hat şehîd kirin, dîsanê Dr. Sadiq Şerefkendî di 11ê Îlonê de li Berlînê hat şehîd kirin. Bi wê boneyê, min nameyek ji her du rêberan re nivîsand û di rojnameya Alaya Azadi de weşand.
Di van şevan de min xewnek dît, Mam Celal li baxçeyê Qelaçiwalanê di bin dareke mezin de, di nav gul û kulîlkan de ye, çaket û pantolekî şîn û kirasek spî, qerefateke sor li xwe kiribû û pêlavek reş ên bê qeytan li ber kiribûn, li ser kursiyeke xeyzeranê rûniştibû û herdu destên wî li her du aliyên kursiyê bûn.
Bi livîna pel û şaxên daran re, tîrêjên rojê carinan li saet û

gustîlka di tiliya destê wî yê çepê diketin, û carinan jî destê xwe yê rastê û tiliyên xwe li ser piyanoya pore xwe yê birincî datîna, ez jî di hizûra wî de rawestiyabûm, daxwaza kursiyekê ji bo mion kir û ez li kêleka wî rûniştim. Bi bê taqetî û bêzarî ji min re got: "Îmad, çima hûn vê rewşa herêmê çareser nakin? ev rewş ji serdema Enfalê, kîmyabarana Helebçeyê, reva komî û şerê navxweyî ne girantir û ne jî dijwartir e. min jî got: Mam Celal xem nexe em hewlên cidî didin ji bo çareserkirinê.
Ji nişkê ve ji xewê şiyar bûm û ji ew dîdara sofîtî ya wekî derwêşekî û Mam Celal wek şêxekî bê par mam. Heman rojê, beriya ku ez biçim ser karê xwe, min serdana mezarê Mam ya li Dabaşanê kir û li ser gora wî Fatîheyek xwend. Hemû bîranînên wî wekî birûskê di hişê min re derbas bûn.
Min xewna xwe ji kak Dilêr Seyid Mecîd re behs kir, û wî jî bi rûkenî gote min: Înşallah xewna te dê were cî.

Xwakurk- Îmad Ehmed digel hêjmarek Pêşmerege

Ji Soranî: Dawûd Çîçek XELAT/ Kurdistanî Nwê

Hevpeyvîna Rûdaw Tv bi Mamoste Ehmed Silêman re

Alîkarê Sekreterê Partiya Pêşverû Ehmed Silêman got, “Em ne dijminê Tirkiyeyê ne. Eger hikûmeta Tirkiyeyê îro bixwaze şandeya Kurdan bibîne em du sibe li cem wan in. Em dixwazin bi dewletên derdorê re dan û standinê bikin.”

Alîkarê Sekreterê Partiya Pêşverû ya Demokrat a Kurd a Sûriyeyê Ehmed Silêman bû mêvanê Bultena Rojava û rewşa siyasî ya Sûriyeyê û paşeroja Kurdan ji Rûdawê re nirxandin.

Ehmed Silêman ragihand ku desthilata nû ya li Şamê hîn jî di nêrînên xwe yên derbarê Doza Kurdan de neyînî ye û neguheriye.

Wî da zanîn ku heta niha ji ber nebûna yekrêziyê şandeyeke Kurdan neçûye Şamê û got, "Eger pirsgirêka Kurdan neyê çareserkirin, pirsgirêkên Sûriyeyê çareser nabin."

Ehmed Silêman amaje bi wê yekê kir ku partiya wan her dem di wê baweriyê de bûye ku çareseriya Doza Kurdan li Şamê ye lê heta niha şandeyeke Kurdan ji bo dan û standinan neçûye paytextê û sedema vê yekê wiha rave kir:

“Berê jî derfeteke baş tunebû ku hêzên Kurdan bi Şamê re bikevin nav dan û standinan. Nêrîna me wekî partî ew bû û hîn jî ew e ku çareserî li Şamê ye.

Lê îro piştî ku Kurdan bi giştî konferansa xwe li dar xist û Desteya Bilind a Kurdan hat avakirin, em dê bi tena serê xwe tiştekî nekin. Divê em di çarçoveya tevgera Kurdan û diyaloga navxweyî de bi hev re biçin Şamê.”

“Divê mafên Kurdan li Sûriyeyê bên misogerkirin”

Ehmed Silêman derbarê daxwazên Kurdan ên ji hikûmeta nû ya Sûriyeyê, bal kişand ser xalên ku di konferansa hêzên siyasî yên Kurdan de li ser wan hatiye lihevkirin û got:

“Em daxwaza Sûriyeyeke nenavendî dikin ku hemû pêkhate tê de mafên xwe bi dest bixin.

Ji bo Kurdan jî divê nasnameya Kurdan di destûra Sûriyeyê de bê naskirin, zimanê Kurdî bibe zimanekî fermî û di çarçoveya sîstemeke nenavendî de Kurd karibin herêmên xwe bi xwe bi rê ve bibin.”

“Desthilata Şamê hîn jî nerînên xwe neguhertine”

Ehmed Silêman li ser metirsiyên li ser Rojavayê Kurdistanê, diyar kir ku desthilata nû ya li Şamê piştgiriyeke mezin a navneteweyî û herêmî wergirtiye û ev yek bandorê li helwesta wan dike û biland:

"Mixabin desthilata Şamê hîn jî nêrînên xwe yên neyînî yên li hemberî pirsgirêka Kurdan û çareseriya giştî ya Sûriyeyê neguhertine.

Piştî bûyerên Siweydayê û piştgiriya ku ji welatên Ereban û cîhanê wergirtin, ew hîs dikin ku dikarin pirsgirêkan bi rêyên leşkerî çareser bikin.

Lê ez bawer nakim ku êrişeke mezin a leşkerî çêbibe, ji ber ku hebûna Amerîka û Koalîsyonê û her wiha hesabên Tirkiyeyê nahêlin rewş bigihîje wê astê.

Îro şert û merc nînin ku li Rojavayê Kurdistanê şer rû bide. Rojava ne wekî Siwêda û Beravê ye, şer dê gelekî giran be.”

Alîkarê Sekreterê Partiya Pêşverû her wiha amaje bi wê yekê kir ku Kurd ne dijminê Tirkiyeyê ne û amade ne bi hemû aliyên ku bandora wan li ser Sûriyeyê heye re diyalogê bikin.

Partiyên Kurdî li Helebê hevdîtinan bi Encûmen û saziyên herdu taxan re dikin

Di dîroka 9 / 8 / 2025an de , partiyên kurdî li Helebê
Partiya Yekîtiya Demoqrat PYD. - Partiya Demoqrat a Kurdî ya Sûrî. - Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê. - Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) hejmarek hevdîtin bi encûmena giştî ya herdu taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê re û hin sazîyên di taxê de kirin.
Di hevdîtinan de rewşa siyasî ya giştî li welêt û herêmên kurdî hatin gotûbêjkirin, Herwiha rewşa gelê kurd li Helebê hate gotûbêjkirin, û tekezî li ser girîngiya hemahengiyek zêdetir di navber "Partiyên Kurdî" û encûmen û saziyên di taxê de hate kirin ji bo xizmet û parastina gelê kurd li Helebê.

Ragihandina Navendî ya
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Ji bo belgekirina binpêkirinên ku li Efrînê dibin û ji bo pêşxistina rojnamegeriya kurdî Desteya sernivîser a

Rojnameya Pêşverû li benda gotar , belgekirin , hest û nerînên we ye.

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Giştî

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê yaPartiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (93 - 94) *Êlûn 2025 Z - 2637 K*

Dengê Pêşverû

Diwazde sal di ser Rojnameya Pêşverû re

Piştî derbasbûna salekê di ser qeyrana Sûrî re rewşa gelê kurd û tevgera wî ya rêzanî û rewşa herêmên kurdî derbasî qûnaxeke din bû, herwiha bandorên neyênî yên wê qeyranê hêdî hêdî li herêmên kurdî jî xuya kirin wek qutbûna çûn û hatinê û girtina rêkê di navber Efrîn,Heleb û herêmên kurdî de û qutbûna kehrebe û alavên pêgihînê , van sedeman zehmetî di gihandina ragihandina partiyê de li seranserî herêmên kurdî peyda kirin , û ji ber pêwîstiya karê rêzanî û xebata partîzanî serkirdayetiya Efrînê ya "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" biryarek standin bi derxistina "Rojnameya Pêşverû"

Di Gulana sala 2013an de hejmara Yekem ji Rojnameyê bi derket û ket nav destê dost û hevalan. Rêketina "Rojnameya Pêşverû" dergeheke nû ji nerîn û derbirînê re vekir û hêviyên dost û hevalan di xebata partîzanî de bilind kirin û bi germahî xwendevanên wê pêşwazî dikirin,rûpelên wê dipelandin û bi hûrbînî mijarên wê yên cihêreng û dagirtî dixwendin

Di destpêkê de ew ji heşt rûpelan pêk hatibû Heft rûpel bi Zimanê Erebî û rûpelek bi Zimanê Kurdî bû. Piştre hêdî hêdî firehtir , geştir û zengîntir bû. Ji sala 2015an de heya bi vê kêliyê "Rojnameya Pêşverû" ji Bîst rûpelên dagirtî dikeve nav destên xwendevanên xwe. Naveroka wê ji Nûçe , Gotar , Hevpeyvîn , Kesayetiyên hejmarê , Rewşa jina kurd , Dîrok , Çand , Fêrkirin û rastkirina zimên , Peywendiyên Kurdistanî , Belge , Efrîn di bin dagîrkeriyê de , pirtûka hejmarê , û Doza Kurdî di Rojnamegeriya Cîhanî de... hwd

"Rojnameya Pêşverû" bi rêbaza xwe ya rêyalîst û hişmend , bi wê logoya xwe ya kesk ku reng ji rengên keskiya zêtûnên Çiyaye Kurmênc û xwezaya Kurdistanê hemerengî daye xebata ragihandin û pirtûkxaneya kurdî. Hêjayî gotinê ye ku derxistin û çapkirina Rojnameya Pêşverû li Efrînê bi derdiket û (3000) kopî dihat çapkirin û belavkirin.

Lê piştî dagîrkirina Efrînê ew demeke kurt hate rawestandin û piştre ji ber rewşa awarte ya ku li herêma Efrînê û ji ber girîngiya wê di nav hevalên rêxistina Efrînê de nivîsgeha rêzanî û serkirdayetiya partiya me biryar dan ku divê "Rojnameya Pêşverû" rêveçûna xwe berdewam bike û ji wê rojê de heya bi vê kêliyê "Rojnameya Pêşverû" di xebata xwe de berdewame û rolekî wê pêşeng û çalak di nav ragihandina partiya me de heye.

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Hevpeyvîna Rûdaw Tv bi Mamoste Ehmed Silêman re

Rûpel 18

Bendava Meydankê we silav dike

Rojnameya Pêşverû

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين